# Destpêkek li ser vekolîna raboriyê ji bo daxwazkerên kar û xwebexşan

Eger tu daxwaza xwebexşî an derfetên kar li Brîtanyayê bikî, dê ji te were xwestin ku tu razîbûna ji bo kontrolkirina raboriyê bidî. Ev ceribandin dikarin stresê bînin, nemaze hekeenerjî, pêbawerî, an deme te kêm be.

Derbaskirina kontrolek raboriyê di rêza yekem de dikare dijwar be. Em hêvîdar in ku ev belgeya agahdariyê dê ji te re bibe alîkar ku tu bi ceribandinê re dijwariyê derbas bikî, da ku derfetên ku ji te re girîng in misoger bikî.

## Kontrolkirina raboriyê kar çi ye?

Kontrolên raboriyê awayên cihêreng diyar dikin ku kesên ku di peywirdarkirina karmendek an xwebexşekî de hewl didin kesan baştir ji ya ku ew bixwe nas dikin, binasin. Ev dibe ku pêk were ji çalakiyên wek

- Piştrastkirina pênaseya te
- Kontrolkirina sertîfîka an belgeyên te yên têkildar
- Ji kesên ku te nas dikin dipirsin ku li ser kesayetî an xebata te şîrove bikin (ev wekî çavkanî tê zanîn)
- Çavdêriya hemî tomarên sûcê
- Pirsîn ji doktorê te li ser tenduristiya te

Fêmkirina ka meriv çawa li Brîtanyayê kontrolek raboriyê pêk tîne dijwar dibe, nemaze ji ber ku ya ku tê xwestin ji rolê heya rolê diguhere, heta di heman rêxistinê de.

### Çima karsaz û rêxistin kontrolên raboriyê dikin?

- Bi kontroleke raboriyê re, rêxistinek hewl dide ku agahdariya ku dê ji wan re bibe alîkar ku di derbarê pêşkêşkirina rolekê bo te de pê ewle bin. Pêdivî ye ku ew piştrast bikin ku bi çavkanî, perwerdehî û piştgirîya berdest,tu dikarî bi rengek ku ji bo xwe û yên din ewledar be, rola xwe pêk bînî.
- Hin kontrolên raboriyê têne kirin ji ber ku rêxistinek pêdivî ye ku bi awayê qanûnî gavan bavêje da ku kesên ku dibe ku destdirêjî li zarokan an mezinên berziyan bikin, an ku dibe ku xetereyek ewlehiyê derxînin holê, bên naskirin.
- Hin kontrolên raboriyê têne kirin ku standardên profesyonel bi cîh bên.

### Di kontrolên raboriyê de çi bijartineke min heye?

- Cihê ku kontrolên raboriyê çê dibin, divê heman agahdariya raboriyê ji bo hemî berendaman li gor qanûnê were xwestin.
- Pêdivî ye ku her gav ji te were xwestin ku tu bi kontrolkirina raboriyê razî bibî, û heke tu nepejirînî, ev tê vê wateyê ku mumkin e ev rol ji bo te neyê pêşkêşkirin.

### Qanûnên ji bo kar û pîşe û rêxistinan çi ne?

- Agahiyên ku rêxistin dikarin û nikarin ji te bipirsin û eva ku ew bi wan re çi dikin, ji hêla qanûnê ve bi tamî têne kontrolkirin. Agahdariyên kontrolkirina raboriyê ya damezirandinê bi rayedarên din ên wekî Wezareta Karên Hundir re nayên parvekirin

- Berî ku tu serlêdan bikî, divê rêxistin rave bikin ka kîjan kontrolên raboriyê ji bo rolê têne kirin. Di heman demê de divê ew têkiliyek binavkirî peyda bikin ku serlêder dikarin pê re biaxivin, da ku li ser pêvajoyê her pirsek bipirsin.
- Kontrolên raboriyê bi gelemperî piştî 'derbaskirina' pêvajoya damezirandina bo kar û gotina ku dixwazî vê rolê qebûl bikî, dest pê dikin.
- Rêxistin divê mesrefên kontrolên raboriyê qebûl bike. Heke kêşeyeke te bi lêçûnê re heye, li piştevaniya karkerekî serekekarkerekî sereke, an şêwirmendek navendek kar bigerin ku dikare bibe alîkar.

## Piştrastkirina pênaseya te

Îsbatkirina pênaseya xwete dema ku tu nû hatiye welatekî an dema tu di pergala penaberiyê de yî, dibe ku dijwar be. Lêbelê, ji bo ku tu bikaribî pênaseya xwe bi hêsanî îsbat bikî, gavên kutu dikarî bavêjin hene.

- Hewl bide ku hin belgeyan ji Xizmeta Aşkerekirin û Qedexekirinê li ser Lîsteya pejirandî bistînî.
- Eger gengaz be, fatûreyek an nameyek fermî bi navê tevahî ji te re were şandin bipirse û piştrast bike ku ew rast hatîye nivîsandin. Çewtiyên di belgeyên xwe de bi lez serrast bike.
- Eger te pêştir rewşeke penaberiyê hebûye û dikarî jê ra pere bidî, an eger xebatkarekî bingehîn dikare alîkariyê bide te, ji bo bawernameya ajovaniyê ya demkî tomar bike.

## Sertîfîka an bawername

Eger tu sertîfîka hene, bibîne ka tu çawa dikarî wan binirxînî û piştrast bikî. Fêr bibe ka li Brîtanyayê navê sertîfîka û ezmûnên beranber çawa tên binavkirin û xelk wan çawa bi nav dike. Ew dikare ji te re bibe alîkar ku tu çêtir fam bikî.

Ger rêxistinek nikaribe kalîteyên we verast bike, balyozxaneya welatê ku tê van  jêhatîbûnê lê girtiye dibe ku ji te re bibe alîkar. Rêxistinên pîşeyî yên li welatê te jî dibe ku di dema kariyera te de di pîşeyê de û jêhatîbûn û zanîna te di derbarê performansa te de piştrast bikin.

Rêxistinên pîşeyî yên li Brîtanyayê di heman demê de dibe ku karibin bibin alîkar ku damezirîner bi hêjatiyên te bawer bin.

## Jêder

Dibe ku ji te were xwestin ku nav û agahdariyên têkiliyê yên kesên ku bi te re ne têkildar in û çend sal in te bi awayê profesyonelî an kesane nas dikin, raber bikî. Rêxistin dê bi van kesan re têkilî dayne û ji wan bipirse ku li ser guncanbûna te ya ji bo rolekê tiştekî bibêjin.

Normal e ku mirovên nû hatine welêt ji bo peydakirina hewcedariyên jêder tê bikoşin.

- Eger tu bi karkerekî sereke re ji nêz ve dixebitî, an heke te zarok hene û xebatkarên dibistana wan te nas dikin, dibe ku ew bikaribin jêdereke kesayetiyê ji te re peyda bikin.
- Eger tu nikaribî jêderekê pêşkêş bikî, bi rêvebirê kirêkirinê re biaxive. Dibe ku di hin rolan de, ew dikarin guhêrbar bin û bihêlin ku tu di rola adaptasyon an çavdêriyê de dest pê bikî. Dibe ku ew hewceyê şêwirmendiya pisporekî bin.
- Eger mirovên te nebin ku ji bo te bibin jêder,tu dikarî rolekê hilbijêrî ku jêderan hewce nake, da ku biakrî ji aliyê kesên ku dikarin di dahatûyê de bibin jêderê te, werî naskirin.

- Di heman demê de heke tu nav û hûrguliyên têkiliyê yên kesên ku tu bi wan re hevdîtin dikî ku dikarin bibin lêvegerên pêşerojê û tarîx, rol û rêxistinên ku tu xwebexşî an jî li Brîtanyayê kar dikî biparêzî, dibe ku ji te re bibin alîkar.

## Kontrolkirina raboriyên sûcê

Eger tu ji bo rolên ku biryar e tu yê têkiliyekên taybet bi mezin û zarokên berziyan re pêk bînî, an jî kutu dikarî xwe bigihînin agahdariyên hesas, serlêdan dikî, dibe ku tiştên jêrîn çê bibin:

- Ew dikarin bipirsin ka te raboriyeke sûc û cezayê heye
- Dibe ku ji te were pirsîn gelo heta niha tu ji ber tevgera xwe di her rolê da hatye cezakirin an jê hatiye qedexekirin.
- Dibe ku ji te were xwestin ku tu  kontrola 'Xizmeta Aşkerekirin û Qedexekirinê' bipejirînî - wekî din wekî 'Kontrola DBS' an kontrolkirina raboriya sûcê tê zanîn.

Xizmeta Aşkerekirin û Qedexekirinê saziyeke fermî ye li Brîtanyayê ku dikare xwe bigihîne agahdariyên têkildarî qeydên sûcdar û sertîfîkayan pêşkêş bike ku beşên têkildar ên qeyda kesekî nîşanî kardêran dide.   Astên cihêreng ên kontrolkirina DBS-ê hene, ji ber vê yekê tenê agahdariyê têkildar bi rola ku tu jê re serlêdan dikî têne parvekirin.

Tewra ku te raboriyeke cezayê hebe,tu dikarî bixebitî an bibî xwebexş, lê dibe ku tu destûra te tunebe ku tu hin rolan bigirî. Girîng e ku tu qeydên ku bi awayê qanûnî hewce ne, di dema serlêdanê de ragihînî. Li ser tiştên ku dikarin ji te werin xwestin ûeva ku tu divê çi parve bikî hin qayîde hene. Eger şika te heye, daxwaza rênîşandanê bike.

Eger tu di encama bazirganîkirina li ser mirovan an jî di encama kiryarên te ku te ji bo zindîmayînê di rêwîtiya xwe ya bo koçberiyê pêk anîne da, hatiye tawanbarkirin, bi parêzer, şêwirmend an karmendekî pêbawer re bixebite da ku çawa di dema dameziandinê de li ser wan biaxivî.

Wekî beşek ji pêvajoyê, dê ji te were xwestin ku tu pênaseya xwe bi karanîna Belgeyên  ku Xizmeta Aşkerekirin û Qedexekirinê wekî Belgeyên Pênaseyê piştrast dike, îsbat bikî.

Dê ji bo gelek kesan dijwar be ku forman dagirin. Eger tu nikaribî belgeyên pêwîst dabîn bikî, tu dîsa jî dikarî bi qeydkirina şopa tiliyên xwe bi polîs re kontrolek DBS bistînî.

- Her kesekî ji 16 salî mezintir, dikare kontrolek DBS-ê werbigire, statûya te ya koçberiyê çi dibe bila bibe an tu çiqasî li vî welatî mabî.
- Bêyî berçavgirtina raboriya kesekî, heke daxwaz bi duristî were şandin, bi gelemperî du hefte hewce dike ku vekolîn were kirin.
- Tevlêbûna di xwebexiyê de ku hewceyê heman asta vekolînê ye ku rola te ya pêşerojê pêdivî pê heye û  dikare ji te re bibe alîkar ku ezmûn û jêderan ava bikî, û tê vê wateyê ku gava tu daxwaz dikî kontroleke te ya DBS heye.
- Heke te ji bo kontroleke DBS-ê daxwaz dabe,tu dikarî li Xizmeta qeyd bikî da ku sertîfîkaya DBS-ya xwe biroj bikî. Ev tê vê wateyê ku kardêrên  an rêveberên xwebexş ên pêşerojê bêyî ku daxwaza kontroleke nû  dikarin qabiliyeta te kontrol bikin. Ji bo nûvekirinê ti mesrefek ji bo xwebexşan tune.
- Ev rêbernameya Ji Daxwazkerên Derveyî Welat ya Karûbarên Aşkerekirin û Qedexekirinê re dibe ku ji te û her rêxistinek ku tu daxwaza tevlêbûna li wê dikî, alîkariyê bike. Ji bo agahdariyên zêdetir serî li belgeya agahdariya me ya li ser kontrolên DBS-ê bide.

### Kontrola navneteweyî

Dibe ku rêxistinek ji bo hin rolan (wek hînkirin an hemşîretiyê) hewce bike ku bizanibe ka te li derê tu li derveyî welat jiyaye, raboriyeke sûcê hene an na. Ji bo welatên cuda rêzik û rêbazên cuda hene. Agahiyên li ser çawaniya bidestxistina "belgeyên karaktera baş" ji bo welatên cihê, ji hêla hikûmeta Brîtanyayê ve hatine dabînkirin.

Kardêr, eger nikaribin kontrolek li ser raboriyê bikin, tê çaverêkirin ku berî ku biryar bidin ka dê pêşniyarek kar raber bikin an na, bi qasî ku gengaz be, agahiyan ji çavkaniyan werdigirin.

Eger mumkin be tu di xetereyê de bî ji ber ku kontrolek statûyê dê statûya te ji rayedarên welatekî din ku tu lê jiyayî re eşkere bike,tu dikarî bi çavkaniyên mirovî (HR)  yên rêxistina xwe re biaxivî an li şêwirmendiya qanûnî bigerî.

### Çareserkirina pirsgirêkê

Di heman halî de ku rêxistin dixwazin bi ewlehî tevbigerin, ew hewce ne ku mirovên ji raboriyên cihêreng serlêdana wan bikin. Pirsgirêk pir caran dikarin bêne çareserkirin eger amaje bi pirsgirêk re û çareseriyên potensiyel bê kirin.

## Dem

Tê bigihêje ka eger vekolîn pir dirêj bibe gelotu yê fersendek ji dest bidî, û gelotu yê îhtîmala ku berî ku vekolîn temam bibe dest bi rolek an perwerdehiyê bikî heye an na.

Eger tu fersendekê ji dest bidî, lê te pêştir serlêdana kontroleke DBS-ê kiribe,tu yê dîsa jî sertîfîkayekî bistînî û ev dikare ji te re bibe alîkar ku tu roleke din bi hêsanî misoger bikî.

## Pêbawerî û pabendbûn

Gelek kontrolên raboriyê ji te dipirsin ku tu agahdarî, belge an têkiliyên ku te tunebin parve bikî, an beşdarî hin pêvajoyan bibî ku tu fêm nakî an jî dibe ku te aciz bikin.

- Çêtir e ku tu bêtir agahdarîyan li ser tiştên ku dê ji te were xwestin ku tu bikî, her wiha dûhatên vekolînan berî ku wan qebûl bikî, daxwaz bikî.
- Piştrast bikin ku tu dizanî ku di kontroleke raboriyê de çi tê pirsîn. Gelek ji peyvan xwedî wateyên teknîkî ne ku ne wek wateyên wan ên normal in û tu sedem tune ku tu wan bizanibî.
- Eger tu fersendekê ku tu jê re eleqedar dibî dibînî, lê kontroleke raboriyê ne gengaz xuya dike ku derbas bibe, hêja ye ku bi rêvebirek damezirandinê an rêveberê Çavkaniyên Mirovî (HR) re biaxivî, an jî di fersenda pêşîn de li şêwirîna profesyonel bigerî.

Dibe ku gelek rêxistin kêşeyên taybetî yên ku mirovên ku di pergala penaberiyê de bi kontrolên raboriyê re rû bi rû ne fam nakin, û dibe ku haya wan ji awayên cihêreng ên ku ew dikarin van astengan derbas bikin tunebe. Pirî caran dê rêyên alternatîf ji bo domandinê hebin.

## WergeraFermî

Belgeyên lêgerînê yên ku divê werin wergerandin, dibe ku balyozxaneya welatê ku agahdarî jê hatîye ve alîkarî bike, li ku derê ewle ye ku tu ji wan bixwazî ku vê yekê bikin.

## Teknolojî û gihîştin

Damezirîner divê bikarin cîhekî rehet û alavên ku ji bo beşdarbûna her vekolînekê hewce ne dabîn bike, û her weha her lêçûnên ku bi pargîdaniyê re têkildar in qebûl bikin. Navendên Kar, pirtûkxane, an navendên civakê dikarin ji te re destragihîştina komputerê û pêwendiyeke baş a Înternetê peyda bikin ku dikare ji te re bibe alîkar da ku tu zû kontrolan pêk bînî.

## Trawma û Tenduristî

Dibe ku tu ferq bikî ku kontrolên raboriyê te ji bo dijwar in, bîranîn û hestên dijwar derdixin an jî dijwar e ku meriv tiştê ku tê pirsîn bişopîne.

Bifikirin ka dê çi ji te re bibe alîkar ku tu di vê pêvajoyê de baş bimînî. Mînakî, heketu dikarî kesekî bi xwe re bînî, an ku pêvajoyek li cîhekî taybetî çêbibe dibe ku bibe alîkar.

Eger tu di derbarê dîroka xwe de an jî di derheqê dijwariya ku tu di vê pêvajoyê de pê re rû bi rû bûyî de hewceyê tiştek kesane bî, ew ê ji te re bibe alîkar kutu yê ji berê de çi bibêjî ûtu yê çawa bibêjî plan bikin.

Hilbijartina rolên ku xwedan peywirdarkirina birêkûpêk in, an fersendên veguheztinê pêşkêşî dikin dikarin stresê kêm bikin, û xetera wendakirina dem û fersendên kêm bikin, eger kontrol demek dirêj bajon, an heke tu hewce ye ku cihê xwe bigherînî.

Eger ezmûnek te ya xirab bi kesên ku kontrolên raboriyê hêsan dikin re hebe û xwe ewle hîs bikî ku bertek nîşan didî, ev dikare ji te re bibe alîkar ku pirsgirêk çareser bibe, û ji te re fersendek peyda bike ku tu dîsa bi mirovan û pêvajoyê bawer bikî. Bi heman rengî, heke te ezmûnek erênî hebe, ew dikare alîkariya mirovan bike ku bibînin ka wan çi baş kiriye.

Ev belavok di Kanûna 2022 an de ji hêla "Migration Yorkshire" ve hatîye nivîsandin. Eger pirseke te hebe, ji kerema xwe têkilî daynin û em ê hemî hewla xwe ji bo alîkariyê bidin: admin@migrationyorkshire.org.uk an jî 0113 378 8188.